Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1098 | 10-Îlon- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

# Çînayetî di nava civakê de

**Li ser çîna xwedî desthilata siyasî li Herêma Kurdistanê lêkoler Kelsûm Gezneyî dibêje: Beşên vê çînê wiha ne ku nêzîkatiyên wan ên neteweyî lewaz in, nirx didin sermayeya welatên biyanî û ji welatên kapîtalîst paşketîtir in.**

Lêkolera Kurd Kelsûm Gezneyî, li ser mijar tevgera çînayetiyê di nava civakê de bawernameya masterê wergirt. Gava wê ev karê xwe dikir, ew di ber re jî li Ofîsa Mafê Mirovan a Soranê dixebitî.

Jina Lêkoler, Kelsûm Gezneyî li Soran di warekî zor û kêm de, bawernameya xwe ya masterê wergirt û wek bi xwe dibêje, berpirsên lêkolînê ji wê re gotin, 'ev karê zilaman e ku tu dikî', lê li dijî vê yekê li ber xwe da û bawernameya xwe wergirt.

Kelsûm Gezneyî çalakvan û parêzvana mafê jinan û zarokane. Ew di heman demê de, ev bû 12 sal ku li Ofîsa Mafê Mirovan a Soranê dixebite. Sala 2019'an wê li Zanîngeha Selahedînê dest bi xwendina bawernameya masterê kir. Û niha wê teza xwe ya li ser 'Tevgera çînayetiya di nava civakê de' ev bawername wergirt. Bi teza xwe ew di 150 rûpelan de agahiyan dide û statîstîkan dinirxîne.



Kelsûm Gezneyî, di vî karê xwe yê zehmet de bi nimûne Herêma Kurdistanê bi tevgera çnayetiyê di nava civakê de daketiye. Çawa ku ew bi xwe dibêje, gelek pirsgirêk derketine pêşiya wê û nerihetî dîtine, ji ber ku mijara lêkolîna wê zehmet bû û gelek dem û enerjî jê re diviya.

### Karekî serketî

Lêkoler Kelsûm Gezneyî derbarê pêvajoya wergirtina bawernameya xwe de got, "Ne karekî hêsan bû, berpirsên lêkolînê ji min re gotin, 'ev karê zilaman e', lê min got, ez ê bikim û serketî bûm. Ji bo wê niha gelek kêfxweş im û ez aram im ku min tiştekî ku mêran tenê ji xwe re dipejirand, kiriye. Di heman demê de lêkolîn û agahiyên derbarê tevgera çinayetiyê de wê xwe bispêrin lêkolîna min, ji ber ku di nava jin û zilamên Kurd de ez kesa yekem im ku bi vê mijarê de daketiye, lêkolaye û bawernameya masterê li ser wergirtiye."


### Di qonaxa guherînê de

Kelsûm Gezneyî her wiha qala bawernameya xwe ya masterê kir û wiha axivî: "Teza min behsa 'Tevgera çînayetiya di nava civaka Kurd de' dike. Gelo civaka Kurd, civakeke di nava guherînê de ye, civakek çandiniyê yan kapîtalîst yan jî arîstokrasiyê ye? Di encama lêkolîna min de derket holê ku civaka Kurd, di nava kapîtalîzm û arîstokrasiyê de ye û di qonaxeke guherînê de ye."

### Li ser nimûneya "Herêma Kurdistanê" ye

Gezneyî wiha axaftina xwe dewam kir: "Min civaka Kurdî li ser çînên cuda dabeş kir û li gorî encaman derket holê ku civaka Kurdî di asta çîna komprador (navbeynkar) de ye, ango tê wateya ku bi burokrasiya kapîtalîst desthilatdariya siyasî digire dest û welat bi rê ve dibe. Beşên vê çînê wiha ne ku nêzîkatiyên wan ên neteweyî lewaz in, nirx didin sermayeya welatên biyanî û ji welatên kapîtalîst paşketîtir in. Ev yek bi heman şêweyî rewşa Herêma Kurdistanê ye ku em dibînin civaka Kurd rêjeyeke zêde kelûpelan ji derve hawirde dike û herî kêm girîngiyê dide hinardekirin û hilberîna kelûpelên navxweyî."

# Zindîkirina Kurmikên beriya 46 hazar salî hêviya siberojê ye



Permafrost ango erda qeşa girtî ya Sîbrîyayê ji bo şopa şînatî, lawir û mîkro organîzmayên piçûk platoyeke bi xêr û bêr e. Gotareke nû ya ku di PLOS Genetics de hatiye weşandin balê dikşîne ser agahiyên nû. Zanyaran da zanîn ku wan hin kurmikên gilover ên 46 hezar salî ku di bin erda qeşa girtî de bûn ji nûve zindî kirine û her wiha hinek ji van kurmikan di taqîgehan de dîsa ji nûve çêkirine. Beriya vê lêkolînê haya tu kesî ji "kurmikên gilover" tine bû û lêkoleran ew weke "Panagrolaimus kolymaensis" binavkirin. Ev kurmikên gilover bi awayekî xerîb xwe xistin rewşa ku "kriptobiyoz" jê re tê gotin û heta îro di bin erda qeşa girtî de man. Ev rewşa "kriptobiyoz" gava lawir dikevin vê rewşê de mirov dihizira ku ew mirîne lê salên dirêj zindî dimînin. Dema ku şert û merc ji bo wan guncan dibin û her wiha derfetan dibînin êdî ji vê rewşê derdikevin û dijîn û ji bo siberojê hêviyê dide Xebatên bi vî rengî berê jî pêk hatin. Yanî ev ne cara yekem e ku kurmikek qeşa girtî ji nûve tê zindî kirin. Lê xebata dawî ji ber ku kurmikên herî kevn ango ên beriya 46 hezar sal berê zindî kiriye yek ji wan xebatên herî girîng e. Di vî zemanî de zindîbûna kurmikên gilover ji bo siberojê hêviyê dide. Nexasim ji bo rewşa germahiyê û krîzên avhewayê yên di salên dawî de diqewimin.

Sudoku: Bersiv 9

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 6 | 3 | 2 | 8 | 7 | 5 | 4 | 1 |
| 8 | 5 | 4 | 3 | 6 | 1 | 2 | 7 | 9 |
| 7 | 1 | 2 | 4 | 9 | 5 | 6 | 8 | 3 |
| 4 | 7 | 9 | 8 | 5 | 6 | 1 | 3 | 2 |
| 5 | 2 | 1 | 7 | 4 | 3 | 8 | 9 | 6 |
| 3 | 8 | 6 | 9 | 1 | 2 | 4 | 5 | 7 |
| 6 | 4 | 8 | 1 | 7 | 9 | 3 | 2 | 5 |
| 2 | 9 | 5 | 6 | 3 | 4 | 7 | 1 | 8 |
| 1 | 3 | 7 | 5 | 2 | 8 | 9 | 6 | 4 |

Sudoku:Pirs 10

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | | 2 | | | 5 | | | |
| 7 | 6 | | | 3 | | 5 | | |
| 3 | 5 | | 1 | | | 6 | 8 | |
| | | | | 6 | | | | |
| 2 | 9 | | | | | | 3 | 6 |
| | | | | 9 | | | | |
| | 7 | 8 | | | 4 | | 6 | 2 |
| | | 9 | | 2 | | | 1 | 8 |
| | | | 8 | | | 4 | | 7 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Feqîr çûn diziyê heyv hê êvarê derket:**
- Bi heman wateyê.

**Feqîr li şovê çû dartitin li qûnê çû:**
- Feqîr çi bikin ti kes ti qîmetî nade wan; her tim yên feqîr zererê dibînin.

**Feqîr û jar weke par û pêrar:**
- Ji bo neguherîna rewşa feqîran tê gotin.

**Filano mal li milano:**
- Bi heman wateyê.

Gotin, kul hatiye gund wê ji her malê du kesan bibe, her kesî li xulam nêrî. Xulam got, yek ez, lê ka yê din?
- Ji bo kesên xizan û bêkes tê gotin.

Gotin, rûto malan bar kir, got, teşta **min di binê çengê min de ye:**
- Ez amade me; ti pirsgirêkên min nînin; tişteke ku bikim nîne.

**Gotin, terziyo malan bar kir, got, derziya min di ber serê min re ye:**
- Bi heman wateyê.

**Girara rohn ji kêmdanî ye:**
- Rewşa wî ji tineyî wisa ye; kêmayî ne ji wî ye.

**Gûyê wî ji nêza nayê:**
- Pir xizan e; tişekî wî nîne; rewşa wî ya aborî nebaş e.

**Hesp û mehîn şer dikin di bin lingan de ker diperçiqin:**
- Serdest bi hev diçin feqîr zererê dibînin.

**Heçî jar e, havînê jî lê sar e:**
- Kesê xizan û perîşan be, rojên salê tev jê re weke hev in.

**Hundir bi qurbana derve bibe:**
- Pir xizan e; tiştekî wî nîne; çawa li derve perîşan xuya dike, hundirê mala wî xirabtir e.

**Hîştir radibin hev, hêstir û ker di bin lingên wan de diçin:**
- Serdest bi hev diçin feqîr zererê dibînin.

**Ji bo tinedîtiyan danhêrik cejin e:**
- Ji bo kesê xizan tiştekî bêqîmet jî biqîmet e.

**Ji kuleka wî dû dernakeve:**
- Pir xizan e; tişekî wî nîne; rewşa wî ya aborî nebaş e.

**Ji nêza bawîşik têne:**
- Pir xizan e; perîşan e; rewşa wî ya **aborî pir xirab e:**

**Ji nêza bêhna bawîşka wî tê:**
- Bi heman wateyê.

**Ji ta û ba ketiye:**
Rewşa wî ya aborî pir xirab e.

**Keleka feqîran binê wê her tim kun e:**
- Şansê feqîran nîne; yên zererê dibînin her tim feqîr in.

**Mala wî barê dîkekî ye:**
- Mirovekî pir xizan e; tiştekî wî nîne.

**Mala wî li ser pişta wî ye:**
- Bi heman wateyê.

# Buroya Hiqûqê ya Asrinê xwe amade dikin bersivê ji bo pêşkêşiya NY'yê ya Tirkiyeyê bidin

Pêvajoya serlêdana Komîteya Mafên Mirovan a NY ya Buroya Hiqûqê ya Asrinê ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û sê miwekîlên xwe yên din ên li Îmraliyê kiriye, berdewam e.**R-3**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1098 | 10-Îlon- 2023 | www.ronahi.net/ku/


# KCK: DEWLETA TIRK DIXWAZE DAGIRKERIYA XWE LI IRAQ Û SÛRIYEYÊ MAYINDE BIKE

Komîteya Têkiliyên Derve ya KCK'ê. Dewleta Tirk ku hem li Iraqê hem jî li Sûriyeyê mafê serweriyê yê herdû welatan binpê kiriye, dixwaze dagirkeriya xwe ya li Iraq û Sûriyeyê mayinde bike. Eşkere ye ku rageşiya li Kerkûk û Dêrazorê ji ber xwe ve nebûye, pêwendiya vê rageşiyê yekser bi serdana Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Hakan Fîdan heye ku 22-24'ê Tebaxê serdana Bexda û Hewlêrê kir.**R-3**



## Şanogerê nemir Yilmaz Guney

Yilmaz Guney derhêner, senarîst, romannivîs û lîstikvanekî kurd bû. 86 sal di ser mirina wî re derbas bûn e. Guney ku hem di sînemaya cîhanê de hem jî di sînemaya Tirkiyeyê de xwedî cihekî girîng e.**R-7**





## Yekemîn sala Şoreşa "JIN JIYAN AZADÎ "



## 'Em piştgiriya xwepêşandanên gel li Siwêdayê dikin'

Endamê Partiya Sûriye Pêşeroj Mihemed Bêrem anî ziman ku hikumeta Şamê li ser xwîna gelan desthilatdarî û berjewendiyên xwe diparêze û got, em piştgiriya xwepêşandanên gel li Siwêdayê dikin.**R-5**

## Xiyaneta PDK'ê û ENKS'ê ya li dijî şoreşa Rojava bê sînor e



Ji destpêka şoreşa 19'ê Tîrmehê ve, PDK û ENKS'ê ji bo têkbirina şoreşê çi ji destê wan hat kirin, di tevahiya êrîşên li ser Rojava de, ew xwdî rolbûn û ji dagirkeriya Tirk re bûn amûr. Herwiha di guhertina demografî de ya ku li Efrînê tê meşandin, rola PDK û ENKS'ê sereke bû.**R-4**



**Êrîşên ser Başûr û Rojava ên hemwext!**
Ahmed Aktaş R-4

# Jineolojî Zimanê Dilê Heqîqetê ye...(2)

**Xecê Şen**

Ew kodên zimanê kurdî ye ku xwedî dîrokeke xwe ya herî kevnar e ku li Çiyastanê Zagrosê zêdetirî 12-15 hezar sal berî zayînê tê teqebûlkirin hebûye. Ev sembol û kodên ziman jî wiha tê xuyakirin. Hinek ji wan kodên yek tîp in, henek ji wan kodên yek kiteyî ne û hinek jê jî kodên sembolî ku li ser keviran, şikeftan hatine nivîsîn, li ser çermê ajalan hatine nexşkirin, li ser laşên mirovan û taybet jî herî zêde li ser dest û rûyê jinan hatine nexşkirin di Xalîçeyan de tê xuyakirin. Sembolên weku xorroz yan jî roj, stêrk, hîv û her karên yekemîn înşa kirine weku sembol di laşên xwe de nexş kirine. Ew kodên felsefeya zimanê kurdî ya Mêhrî-Mîtrayî ya nexşî û sembolî ku li Çiyastanê Zagrosê avabûye, di roja me ya îro de bi hezaran nexşên Xalîçeyan de tê dîtin. Em van kod û sembolan di pirtûka bi navê "Fesefî ve Mîtolojîk Açidan Kürt Halı ve Kilim Desenlerî"ya Îkram Îşler ku bi awayeke akademîk nivîsandiye û ji weşanxaneya Sîtavê derketiye dibînin.

" Kürt kilim ya da hali sanatı demeşînin neden bu yapıtların hem biçim hem de anlatığı şey açısında çok özel ve orijinal olmalarında kaynaklanmaktadır"rp-144.

Herwiha nivîskar Toby Wilkinson jî di xebata xw ya bi navê "Eski Misir Uygarlığı" de jî kod û sembol wiha pênase kiriye; "İdeoloji ve onun görsel ortağı ikonografi ifadesidir. Sembolizm toplumsal düşüncenin anlatımıdır. Bir toplum ne düşündüğünü, nelere inandığını, nasıl bir yaşam tarzı sürdürdüğünü sanatından, edebiyatından ve düşüncelerin herhangi bir biçimde dile getirdiği araçlardan öğrenebiliyoruz. Xalîçe ya da Halı kilimlerde kullanılan sembolleri de bu anlamda düşünmek gerekir".rp-19-23.

Bêguman ji van mînakên jor jî tê xuyakirin ku civaka ku li gor jiyana xwe semolên û kodên zimanê xwe çêkirine û di rûpelên dîrokê de dabe nexşkirin, ne çêkirina sembolan û ne jî kodên zimanê jiyana wê civakê di civakeke din de û li gor çanda jiyana wê civakê weku reseniya xwe nayê vegotin û nayên çêkirin. Ev rastiya heqîqeta civaka xwediyê wan sembol û wan kondan e. Her weku min li jor jî daye xuyakirin, civaka kurdan civakeke herî kevnare ya Çiyastanê Zagrosê ye. Di vê wateyê de kodên ziman û sembolên felsefeya kurdî ya herî kevnare ya serdema fikrî û hizrî ya serdema felsefeya herî kevnareyî ya kurdan Mêhrî-Mîtrayî xwedî heqîqeteke wisa ye. Kodên ziman û sembolên wê jî li tu civakên din nayê yan jî tu civak nikarin reseniya wê xirab bike. Li ser hinek pirtûk û belgeyên dîrokî yên cîhanê re sedan salan derbas bûye, ev pirtûk û belge bi gelek zimanan hatine wergerandin, lê dîsa jî tu kesî nekariye kodên ziman û sembolên serdema felsefeya Mêhrî-Mîtrayî tune bikin an jî reseniya wan xerab bikin. Civaka kurdan û felsefeya kodên ziman û sembolên kurdî xwedî taybetmendî û heqîqeteke wisa ye.

Hinek ji wan sembol û kodên zimanê kurdî ev in;

Tîp jî tîpên herî zêde ku di nexşên Xalîçeyan de tê dîtin jî tîpa A, Z, M, W,X, S, H, K, N, Ç e yê ye. Û herwiha ji wan tîpan jî di Xalîçeyan de gelek kod û ji wan kodan jî gelek navên Xalîçeyan tên xuyakirin. Aw-Ab, Az, Xor, Rû, Roz, Kêl-Kêlêm bi (tirkî İlmek-Kilim/ ew jî di esasê xwe de farisî ye) Xan, Xalî, Ax-Aw ev her pênç kod resen pênaseya ax û avê û çandiniyê ye û bi yek ser peywendiya xwe jî bi jin û axê re heye. Ebrû, Zebare, Çaw, Por, Firêt, Polet, Hebok, Xwîrşîk, sênet, Lûjen, Lûjenya, Liba, Jen, Jîk, Zîk, Nîk, Mak, Çilîx yan jî Potix, Al, Kew-Kewîn, Pêz, Sîçe, Belok, Qiçîk, Pîş, Teş, Mamojork, Zîk, Zîlî yan jî Zîl-Zîlan, Nîkahest, Hîmaylok, Hêmayîl, Şê, Şirîk an jî Rûtîk, Nîmîz, Lîpya, Xwelîpya, Lîlûper (Nilüfer). Ji van kodan jî gelek kodên weku Kewîn, Hebok, Xwîrşîk, Lûjenya, Mak, Xan, Guldexwîn, Zîlî yan jî Zîlan, Nîkahest, Hîmalok, Lîpya,Ebrû, Mamojork, Lîlûper bûne navên Xalîçeyan. Ji wan Kodên bal kêş ku bûye navê Xalîçeyan yek jî gula Lîlûper yan jî Lotûs-Nîlûper ( bi tirkî Nilüfer) e.

Xalîçeya bi navê Lîlûper mirov dikare bibêje ku bi tena serê xwe dîroka deh hezar salan di nava xwe de diparêze. Dema ku mirov bi baldarî li vê Xalîçeyê û sembolên ku di nav de hatine nexşkirin dinihêre mirov bi dehan tîpên weku A, Z, S, X, W, M T, dibîne. Dîsa şemala nexşê, sembolên her çar axşên gerdûnê As, Aw, Ax, Ar û sembola Mar dibîne. Ev kod û sembolên ku di vê Xalîçeyê de hatine nexşkirin weku di nava şer û cengê de be rengê hebûna xwe dide der.



Bêguman gula Lîlûperê yan jî Lotûs xwedî felsefeyeke xwe ya pir kûr-dûr û hûr heye. Gula Lîlûperê di jiyan û jiyariya baweriya civaka kurdan de xwedî ciheke xwe ya pir girîng û pîroz heye. Gula Lîlûperê sembola felsefeya Mêhrî-Mîtrayî ye. Li gor efsaneya serdema felsefeya Mêhrî-Mîtrayî şeva herî dirêj a Şeva Çilê anku sersala kurdan Şeva Yelda ji gula Lîlûperê afiriye û derketiye dinyayê. Anku sembola roj- tav-ronahî û avê ye. Di baweriya Mêhrî de gula Lîlûpere hevtûxma Tav û Avê ye. Anku li dijî tarîtiyê sembola berxwedan û ronahiyê ye. Ew di nava avê de şîn dibe, lê herdem berê wê li tav û rojê ye û bi hilhatina tav-rojê ê re serê xwe vedike û bi xor veregê de jî serê xwe digire û di dema reş tarî de jî li dijî tarîtiyê xwe diafirîne û dibe ronahî. Etîmolog Qendîl Şeyxbizînî di nivîsa xwe ya bi navê Lîlûperê de wiha pênase kiriye.

"Lîlûper di warê çand û baweriya Kurdan û di nava civakê de pênase ku eger di xewn de kesek gula Lîlûperê bîbîne sûd û fayde ye, lê hildana wê ya ji nav avê jî nîşaneya xemê ye. Herwiha di nava Kurdan de gula Lîlûper û jinsalarî yan jî dayîksalarî ya Mêhrî-Mîtrayî bi gula Lîlûperê tê pênase kirin, pêlên wê, rengê wê weku hêmana jinê hatiye dîtin".

Bêguman di hemû lêkolîna de jî derdikeve holê ku serdema fikrî-hizrî ya serdema felsefeya Mêhrî-Mîtrayî serdemeke jinxasî û jinsalariyê bûye. Weku şopdarê hêmana vê heqîqeta ronahiyê jî di roja me ya îro de ronahiya zanista jinê Jineolojiyê pêkan e. Ji ber vê keda pîroz û dîroka bêhemparye ku em pê bawerin pir bi hêsanî dikarin bibêjin ku Jineolojî zimanê vegotina dilê heqîqetê ye.

Çavkanî;

Jineolojiye Giriş-rp-20. Ji weşanxanya Aramê.

Parêznameya Abdullah Ocalan Civaknasiya Azadiyê rp-174. Ji weşanxaneya Aramê.

Wêne û çavkanî ji pirtûka Îkram Îşler Felsefe ve Mitoloji Açıdan Kürt Hali ve Kilim Desenleri .rp-19-23-144. Ji weşanxaneya Sîtavê.

Qendil Şeyxbizînî Lêkolîna li ser gula Nîlûperê.

Pirtûka min a li ser felsefeya Hûnerê ya Mêhrî-Mîtrayî Hûmîtra

# Partî û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê greva giştî ragihandin

Di salvegera yekemîn a serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' de partî û aliyên siyasî yên li Rojhilatê Kurdistanê di 16'ê Îlonê de greva giştî ragihandin û banga tevlîbûnê kirin.

Partî û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê ji ber salvegera yekemîn a destpêkirina serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' daxuyaniyeke hevpar weşandin.

Di daxuyaniyê de hate ragihandin jina Kurd a ciwan Jîna Emîna ya ji bajarê Seqizê li Tehranê di encama êrîşa hêzên dewletê de jiyana xwe ji dest da û bû sembola serhildana girseyî ya bi dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî', ku li Kurdistanê destpê kir û li hemû bajar û navçeyên Îranê û derveyî welat belav bû.

Hate destnîşankirin ku ev serhildan a ku weke 'Şoreşa Jîna' jî tê naskirin, bû serhildan û nerazîbûna herî girseyî û dirêj ku desthilatdariya Komara Îslamî xiste ber lêpirsînê û hate gotin, "Sala bihurî û di proseya wê şoreşê de tevgera azadîxwaz a xelkê Îranê bi giştî û xelkê Kurdistanê bi taybetî li dijî rêjîma desthilatdar di Îranê de ezmûna pêvajoyeke nû û girseyî kir û gaveke berdewam pêşde çû ku êdî paşde jî nazivire. Rola berçav ya jinan di pêşengtiya wê şoreşê de, bû sedem ku civaka me di milê civakî de pêngavek din ber bi pêş ve biçe û asoya serketinê ronîtir bibe. Ciwanan di jortirîn asta fedakariyê de ji bo jiyaneke azad û dilxwaz fedakariyeke bêhempa kirin."




**Daxuyaniyî bi vî rengî berdewam kir:**

"Di salvegera destpêkirina şoreşa Jîna Emînî de, em rêzgirtina şehîdên wê şoreşa rêzgirtin ji cangoriyan û zindaniyên siyasî û her wiha zindîhiştina wê tevgera siyasî, em bi awayekî xurt ber bi pêşwaziya wê boneya mezin ya siyasî û civakî ve diçin. Ji bo wê yekê piştî çend hevdîtin û ravêjên siyasî, roja Çarşemiyê 15`ê Hizêrana 1402 an de (6`ê Hizêrana 2023) partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê yên wek:

- Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê (HDKÎ)
- Komele (Rêxistina Kurdistanî ya Hizba Komunîsta Îranê)
- Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK)
- Rêxistina Xebata Kurdistana Îranê (Sazimanî Xebat)
- Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK)
- Komeleya zehmetkêşên Kurdistanê

Li ser xalên jêr lihev kirin:

1- Piştevanîkirin ji daxwazên têkoşerên civaka sivîl û rêxistinên serbixwe ji bo rêzgirtin û beşdariya çalak a salroja şoreşa Jin, Jiyan, Azadî.

2- Ragihandina roja 25-06-1402 (16-09-2023) weke roja greva giştî li hemû Kurdistanê. Di wê rojê de hemû dikan, bazar û navendên kar û îdarî bêne girtin. Serê sibeha wê rojê girseya xelkê Kurdistanê di bajar, navçe û gundên Kurdistanê de serdana aramgeha Jînaya ciwan û hemû şehîd û cangoriyên şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî"yê bikin û destegulên rêz û xweşewîstiyê ser aramgehên wan deynin û merasima rêzgirtinê birêve bibin.

3- Daxwaz ji hemû xelkê azadîxwaz yên Îranê (jin, ciwan, karker, mamosta, xanenişîn, jîngehparêz û neteweyên bindest) li seranserê Îranê ku piştevaniya gireva xelkê Kurdistanê bikin û bi gireveke giştî nîşanî hemûyan bidin ku şoreşa 'Jin, Jiyan, Azadî' heya gihiştin bi armancên xwe wê berdewam be.

4- Daxwaz ji hemû têkoşerên çalak, hêz û aliyên pêşketinxwaz yên derveyî welat dikin ku bi hemû awayî piştevaniya xwe ji bo gireva giştî ya salroja şoreşê bikin û di wê rojê de xwepêşandan û meşên girseyî birêve bibin û bala hemû civakên mirovhez ên cîhanê bikêşînin ser piştevanîya şoreşa jînayê.

5- Her yek ji partî û aliyên siyasî yên Kurdistanê ku beşdariya wê rûniştinê bûne, piştevanî û beşdariya xwe ji bo gireva roja 25-06-1402 (16-09-2023) û merasimên ser aramgehên şehîd û cangoriyan radigihînin."




# Şanogerê nemir Yilmaz Guney

Yilmaz Guney derhêner, senarîst, romannivîs û lîstikvanekî kurd bû. 86 sal di ser mirina wî re derbas bûn e. Guney ku hem di sînemaya cîhanê de hem jî di sînemaya Tirkiyeyê de xwedî cihekî girîng e .

**Deriya Çiya/ Qamişlo**

Yilmaz Guney navê wî yê rastî pûtûne ku tê wateye tovê fêkîyê hişk, di sala 1937`an de li gundê Yenîce yê Edeneyê ji dayik bûye . Bavê wî Hamît ku ji Sîwereka navçeya Şanliurfayê bû, piştî ku herdû birayên wî hatin qetilkirin koçî Yenîceyê kir. Diya wî ji Vartoya Mûşê bû. Dê û bavê wî koçî Edeneyê kirine û di zeviyên pembû de kar dikirin. Yilmaz di nav çîna karkerên kurd de mezin dibe. Ji bilî xebata li zeviyan, wî gelek karên din jî kiribûn, di nav de fîlimê ajokarê erebeya hespan û nivîsandina kurteçîrokan ji bo kovareke herêmî. Gotara wî ya yekem di Tebaxa 1955'an de û helbesta wî ya yekem hefteyek şûnda dema ku ew hîna refa 12an dixwend hat weşandin. Nivîsandina wî ew bi desthilatdaran re kire nava tengasiyan, nemaze ji bo kurteçîrokek ku wî li ser kesek ku ji bo cîhanek çêtir armanc dike nivîsand, ku wekî propaganda Komunîst hate hesibandin û ji ber vê yekê salek û nîv cezayê girtîgehê lê hat birîn. Van serpêhatiyan zemîna xebata wî ya paşerojê ku bi giştî li ser wênesaziyek realîst a kesên bindest û marjînal ên di civaka Tirkiyê de radiweste, danîn. Guney di sala 1957'an de li Zanîngeha Stenbolê dest bi xwendina huqûqê kir, lê bi lez û bez ket nav endustriya sînemayê ku ji dema xwe ya li Edeneyê pêwendiya wî hebû. Li Stenbolê romannivîs Yaşar Kemal nas kir, ku wî bi kesên din ên Edeneyê yên ku di pîşesaziya sînemayê ya Stenbolê de dixebitin ve girêda. Yimaz Guney di fîlmekî xwe de behsa serhildana zarokên Anatolyayê yên bindest ên li dijî desthilatdariyê dike û di vê serdemê de dema ku dest bi bangewaziya



girseyê kir nasnavê 'Qralê Xemgîn' girt. Di van salan de berhema wî ya herî balkêş "Qanûna Sînoran" bû ku derhêner û nivîsara wê Ömer Lütfü Akad bû.

**Ceza û dema girtîgehê**

Yilmaz Guney bi hinceta ku çekdarên din ên Eniya Rizgariya Gel a Tirkiyê veşartiye, bi taybetî Mahîr Çayan, ku di sala 1971'ê de berpirsê kuştina Efraîm Elrom bûn, 2 sal cezayê girtîgehê û hat mehkûmkirin. Guney di dema mayîna xwe de di kovara Guney de, ku wê demê dest bi weşana xwe kir, raman, helbest û çîrokên xwe yên li ser sînema û hunerê diweşîne. Bülent Ecevit di 20'ê Gulana 1974'an de di encama efûya giştî ya ku ji aliyê Hikûmeta 37emîn a Tirkiyeyê ve di bin banê Serokwezîrtiyê de hat dayîn, ji girtîgehê derket. Guney ku zêdeyî 2 salan di girtîgehê de ma, di heman salê de fîlma "Heval"kişand. Dîsa di heman salê de, dema kişandina fîlmê Anise, Adana's Hakimê navçeyê Sefa Mutlu, li taxa Yumurtalikê di casinoxaneyekê de kuşt û hat girtin. Di 13'ê Tîrmeha 1976'an de di encama darizandinên ku di 25'ê cotmehê de li 1'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê dest pê kir de 19 sal cezayê girtîgehê lê hat birîn. Eleqeya wî ya bi sînemayê re di girtîgehê de jî berdewam kir. Fîlmên wî yên bi navê "Sürü" bi derhêneriya Zeki Ökten û " Yol " bi derhêneriya Şerîf Gören di vê serdemê de rastî eleqeyeke mezin hatin . Paşê wî ji nû ve redaktasyona The Road kir û di Festîvala Fîlman a Cannesê de xelatek wergirt.

Piştî ku 5 sal di girtîgehê de ma, di 9'ê Cotmeha 1981'an de ji Girtîgeha Nîvvekirî ya Ispartayê reviya derve. Reva Guney ji girtîgehê fîlmên wî anî bîra wî. Di fîlma Kurê Îblîs de ku wî bi salan beriya ku bikeve girtîgehê kişandiye , çîroka zilamekî ku derketiye betlaneya rojekê û winda bûye vedibêje. Wî jiyanek mîna fîlma xwe jiya. Guney ku bi rojek betlaneyê ji girtîgehê derket. Paşê koçî Fransayê kir û dawiya jiyana xwe li wir derbas kir.

Piştî reviya derveyî welat, li Fransayê fîlmê Dîwar kişand.

Guney di sala 1983'an de bi helbestvanên kurd ên wek Cigerxwîn û Abdurrahman Şerefkendî re Enstîtuya Kurdî ya Parîsê damezrand. Di adara 1984'an de di pîrozbahiya Newrozê de wiha axivî:

"Hevalno! Êş, zulm, feqîrî, xwîn û hêsir ne qedera gelê Kurde. Em vê qederê red dikin! Em vê qederê nas nakin! Em ne zarokên welatekî kolonyalîst ji her alî ve, lê dewletek serbixwe ne... Em dixwazin li ser axa xwe, di bin ala xwe de azad û serbixwe bin.. Hevalno!.Armanca yên şer dikin û dimirin ev e . îro li çiya, deşt û zindanên faşîst li dijî zulm û zordariya kolonyalîstan li gelek deverên Kurdistanê têdikoşin!Em bîranîna kesên di vê dozê de jiyana xwe ji dest dane, di dilê xwe de û di têkoşîna xwe de zindî dihêlin. .."

**Berhemên Yilmez Guney**

Fîlmên Guney nêzî 23'ê fîlmîne hinek jiwan; Qanûna Sînoran, Qiralê Xirab, Seyid xan (Bûka Welat), Mirovekî xirab û Hêvî.

Fîlmên li Guney hatî çêkirin

Yilmaz Guney: Jiyana Wî, Fîlmên Wî (Jane Cousins-Mills, 1987)

Legend of the Ugly King (Hüseyin Tabak, 2017)

Yilmaz Guney: Bi Sedemek Serhildêr (Karzan Kardozi, 2013)

Balada Sirgûnan Yilmaz Guney (Ilker Savaskurt, 2016)

**Xelatên wî**

1967: 4emîn Festîvala Fîlman a Porteqala Zêrîn - Lîstikvanê Herî Serketî - Law of Borders

1970: 2. Festîvala Fîlman a Zêrîn Boll - Fîlma Herî Baş - Hêvî

1970: 2. Festîvala Fîlman a Zêrîn Boll - Senaryoya Herî Baş - Hêvî

1970: 7emîn Festîvala Fîlman a Porteqala Zêrîn - Lîstikvanê Herî Serketî - Mirovekî Ugly

1970: Diyariya romanê ya Orhan Kemal - Bi stûyê xwe mirin

1971: 3. Festîvala Fîlman a Zêrîn Boll - Fîlma Herî Baş - Requiem

1971: 3. Festîvala Fîlman a Zêrîn Boll - Senaryoya Herî Baş - Requiem

1971: 3yemîn Festîvala Fîlman a Golden Boll - Derhênerê herî baş - Requiem

1972: Diyariya romanê ya Orhan Kemal - Bi stûyê xwe mirin

1975: 12. Festîvala Fîlman a Porteqala Zêrîn - Senaryoya Herî Baş - Xemgîn

**Sirgûn û mirina Yilmaz Guney**

Di Îlona 1980 de, xebatên Guney ji aliyê cûntaya leşkerî ya nû ve hatin qedexekirin û Guney wiha daxuyand:"Tenê du îmkan hene:Şerkirin an dev jê berde, min şer hilbijart". Piştî ku di sala 1981'ê de ji girtîgehê reviya û Fransayê, Guney di Festîvala Fîlman a Cannesê ya 1982- an de bi fîlma xwe ya Yol ( Rê ) ku derhênerê wî yê qadê careke din Şerîf Gören bû, Xelata Palmiyeya Zêrîn stend. Heta sala 1983'yan Guney dîsa dest bi derhêneriyê kir û di fîlma xwe ya dawîn Duvar ( Dîwar) de çîrokeke hovane ya zarokên girtî vedibêje. ku li Fransayê bi hevkariya hukûmeta fransî hate çêkirin. Di vê navberê de, dewleta Tirk hemwelatîbûna wî betal kir û dadgehê bi awayekî negirtî 22 sal cezayê girtîgehê lê birî.

Yilmaz Guney di 9'ê Îlona 1984'an de li paytexta Fransa Parîsê ji ber pençeşêra gede jiyana xwe ji dest da. Ew li goristana Père Lachaise li Parîsê tê veşartin .

# Pirtûka 'Hunera 55 salan Dilovan' hate weşandin

Hozan Dilovan hunermendeke ku bi kilamên xwe di hiş û dilê gelê Kurd de cih girtiye. Yekem car di sala 1969'an de, di 15 saliya xwe de, di Newroza Moskowê de derket ser dikê. Hunera Hozan Dilovan, ku di sala 1980 de li Yekîtiya Sovyetê de jî bi navê 'hunermendê dewletê'wergirtiye, kevneşopiyeke malbatî ye. Kurê dengbêj Reşîdê Baso, yek ji dengbêjên nas ên Radyoya Êrîvanê ye. Hunermendê Kurd Nivîskar Hemîd Ûrmiye li ser pirtûka "Hunera 55 salan Dilovan" ku jiyan û hunera Hunermendê Kurd ê navdar Dilovan vedibêje.

**Pirtûka hozan Dilovan?**




Pirtûk li ser jiyan û bi taybetî jî jiyana hunerî ya hozan Dilovan hatiye berhevkirin, ji xeynî vê berhem û helbestên Dilovan jî weke arşîv di vê pirtûkê de hatine komkirin. Bi giştî di pirtûkê de lêkolînek berfireh der barê jiyana hunerî ya hozan Dilovan de hatiye kirin.

**Fikra nivîsandina pirtûkeke wiha ji ku hat?**

Zindî ragirtina ked û xebata hunermendan bi her awayî erk e li ser milê me hemiyan. Ji ber vê min berê jî gotibû rêzgirtina herî mezin ji keda hunermendan re berhevkirina jiyana wan weke pirtûk ji bo arşîva pirtûkxaneya kurdî ye.

Herweha pirtûk ji 247 rûpelan pêk tê. Ji weşanên Sîtav çap û belav bû.

**Cihê Dilovan di huner û çanda Kurdî de?**

Ji bo pir kesan pirsa çima navê pirtûkê Hunera 55 Salan Dilovan e! Hozan Dilovan 55 salan bêrawestan, bi hemî hêz û quweta xwe xizmeta hunera Kurdî kiriye û di wan 55 salan de wekî stêrkeke hunerî li ser dikê ronahî daye çand, huner û zimanê Kurdî. Va ye îro em encama hunera 55 salan Dilovan dibînin û li bejn û bala wî pîroz dikin, navê berhemê jî ji keda salên bihorî hatiye wergirtin. Dilovan weke navê xwe, dilovanê çand û hunera Kurdî ye û bi hunera xwe ya zêrîn bûye serkêşê wêje, çand û hunerê ku bi sedan ciwanan di qada hunerê de mafa jê wergirtine.

Destpêkirin û qutbûna pirtûkê ne zêde demgir bû, piştî çend mehan qediya. Amadekirina vê pirtûkê ji min re weke senaryoyekê bû û bi kelecan kêlî bi kêliyên wê re dimeşiyam.

**Erkên ku dikeve ser milê Hunermend û nivîskarên Kurd**

Hêviya gel ji hunermend û nivîskran pir e, ji ber wê erka ku dikeve ser milê wan giran e. Erka nivîskar û hunermendan e wêje û çandê biparêzin, bêrawestan binivîsin, berheman bidin ber destê xwendevanan û berî her tiştî li ser ziman pir bi micidî bixebitin.

# Sala perwerdeyê ya 2023-2024'an dest pê dike

Semîra Hac Elî diyar kir ku vekirina dibistanan ji bona sala xwendinê ya 2023-2024`an di roja 3`ê Îlonê ji aliyê Rêveberî û mamosteyên dibistanan destpêdike û wê di 10`ê Îlonê de bi rengekî fermî destpêbike.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Bi şoreşa Rojava re gelek destkeftiyên mezin pêkhatin. Yek ji wan destkeftiyan zimanê ku ber bi qirkirnê ve diçû vejînkir û di dibistanan de bi rengekî fermî dest bi zimanê dayikê hate kirin. Bi demê re Zanîngeh û Peymangeh jî hatin avakirin. Ji neha ve amadekarî ji bona sala xwendinê ya 2023-2024`an tên kirin û hejmara mamosteyên heyî jî derdorê 43 hezar û 99 Mamostene. Herweha hejmara şagirtên heyî jî derdorê 863 hezar û 388 xwendekarin. Dibistanên ku ji bona demsala xwendina hatine amdedekirin jî 4 hezar û 130` dibistanin. Derbarê amedekariyên sala xwendinê ya 2023-2024`an de Hevseroka Desteya Perwerdê û Fêrkirinê ya bakur û rojhilatê sûriyê Semîra Hac Elî ji rojnama me re axivî.



Semîra Hac Elî diyar kir ku di dema havînê de civînên sala xwendinê li hemû herêman hatin li darxistin û wiha got: " Encamên civînên salê ya desteya perwerdê û fêrkirinê a bakur û rojhilatê sûriyê hatin li dar xistin, di nav de guftugoyên ji bo sala xwendinê ku çawa karibin bi rengekekî serkeftî derbas bikin hatin kirin. Bi taybet jî li ser kêmasiyên ku di sala derbasbûyî de derbasbûne û ji bona ku di sala xwendinê ya nû de derbas nebin. Hem jî hin encamname hatin derxistin ew jî girêdayî pêşketina xwendekaran û perwerdekirina Rêveberên dibistanan li ser bingehên Meslekî, Pisporî û Hizirî bû. Herwiha Desteya Perwerdê û Fêrkirinê ya bakur û rojhilatê sûriyê di 1`ê Îlonê de Akadimiya perwerde û lêkolînên istiratecîk li bajarê Qamişlo vekir. Bi mebesta perwerdekirin û xurtkirina asta Rêveberên dibistan û desteya akademiyan hatin vekirin."

**"Amedekariyên dibistanan ji sedî 80 hatine temam kirin"**

Semîra Hac Elî di berdewamiya axaftina xwe de got: " Perwerdeyên havînî dema wê 3`ê mehin, bêtir em girîngiyê didin aliyên pisporî, meslekî û hizrî, di demsala havînê de li hemû herêman perwerdeyên Biranşan, Naskirina sîstema perwerdê, Rêzikname û felsefa perwerdê ji aliyê perwedenasiyê ve hatin vekirin. Herwiha di civîna salê de pêşinyar hebû ku ji dêvla perwerdeya havînê roja şemiyê bibe roja perwerdeya mamosteyan, ev yek bi erêkirina komîteyên perwerdê û desteya perwerdê hate pejirandin. Pilansaziya komîte û desteyên perwerdê li herêman di çarçoveya amedekariyên li gorî pêwîstiyên mamosteyan tê kirin. Ji bo amedekirina dibistanan û peydakirina alavên destdayinê û peydakirina hemû pêwîstiyên dibistana, amedekarî ji bona vê yekê tê kirin. Hijmareke baş ji pirtûkên xwendekaran hatine çapkirin û dema ku dibistan vebin wê werin belavkirin û hin di çapê dene û di dema pêş de wê li dibistanan werin belavkirin. Ji bona pêdiviyê dibistanan ji milê mazotê ve amedekarî têne kirin."

**"Demsala xwendinê ya 2023-2024`an wê bi serkeftî derbas bibe"**

Hevseroka Desteya Perwerdê Semîra Hac Elî axaftina xwe wiha bi dawî kir:"Bi rastî astengiyên li pêşiya me çaksazkirina dibistana ye, hinek jê bi alîkariya hin rêxistinan em çeksazdikin, yên din jî bi darayiyên deste û komîteyên perwerdê li herêman têne çeksaz kirin. Herwiha şert û merçên ku îro Rêveberiya xweser bi giştî li bakur û rojhilatê sûriyê tê re derbas dibe û li gorî derfeta heyî em amadekariyên xwe dikin ku zarokên me bê xwendin nemînin. Dibe ku hin lawazî hebin jî, lê li gorî derfetên heyî û rewşa ku em tê re derbas dibin, helbet bandora wê jî heyanî astekî wê li ser kar û xebata me jî hebe. Lê heyanî ku derfet hebe em nahêlin ku xebatê perwerdeyê biseknin. Di dawiyê de jî em sala xwendinê ya 2023-2024`an li hemû mamoste û xwendekarên xwe pîroz dikin û bi hêvîne ku saleke serkeftî derbas bibe. "

# Yekemîn sala Şoreşa "JIN JIYAN AZADÎ "

**Kakşar Oremar**

Her bûyer dema ku rû dide, nasnameya wê di dirûşmên wê de ye. Salek ji şoreşekê derbas bû ku di hemû temenê komara îslamî a Îranê de ne ewqas bedelên giran hebûne û ne jî ewqas bûye sedema lerzandina stûnên rejîmeke îslamî ku ji destpêkê heya niha jin di çavên hakimên wê de di dereca duyê û sêyê de bûye.

Diruşma "Jin, Jiyan, Azadî" bi awayê herî eşkere daxwazên gelên Îranê nîşan dide.

Roj 16. Îlona sala 2022an. Jîna bi destê berpirsên komara îslamî li Tehranê hate kuştin. Çend roj şûnde termê wê li aramistana Ayçî a bajarê Seqiz hate veşartin. Li wira yekemîn car bi dirûşima" Jin, Jiyan, Azadî" çirûskên şoreşekê roj ji rojê zêdetir gortir bûn û ji Seqiz destpêkir û heya Mehabad, Urmiye, Sine û hemû Îranê ronahiya xwe li her derê belav kir.

Xwîna keç û lawên welatê Rojê ji mêjda bû ku ketibû herikîna xwe a ji gûherandinên bingehîn re. Lîstikvanên wê şoreşa mezin teorîsiyenekî navdar yê bi navê Ocalan û xwendevanên wê xwendingehê jî şpreşgerên mîna: Sakîne Cansiz, Azîme Anûş, şervanên qadên girtîgehên dewleta dagîrkera Tirkiyê li bakurê Kurdistan û çelengên qadên şerê bi Daîşên korbîn re li Kobanê û Rojava bûn. Ew ramanên felsefî ji bakur û Rojavayê Kurdistanê gehabûn rojhilatê Kurdistanê jî.

Sal 2010, dema ku Şirîn Eemhulî bi destê rejîma dîktaora îslamî li Îranê hate îdam kirin, hevalên wê li ser dera herî bilind a dîwarê hocreya wê rastî nivîseke sê peyvî hatibûn:" Jin, Jiyan, Azadî...".

Sedemeke herî mezin a îdama Şirînê îmana wê bi şoreş û mafên wekhevî ji jin û mêran re bû.

Sala 1987an teorîsyenê qada Jineolojiyê A. Ocalan li dijî sê têgehên: "cinsiyet, mirin, koletî" li ser dirûşa:" jin, jiyan, azadî" bi hûrgilî sekinîbû û nirxandineke wiha kiribû:" Heya jin azad nebê civak û welat azad nabin..."

"Jin, jiyan, azadî" şireşeke siyasî û civakî ye ku berê ji aliyê şervanên jin ên Kurd li bakurê Kurdistanaê û piştre di şerê li dijî DAIŞê de bû pareke cudanebûyî a têkoşîna jin û keçên Kurd li gelek welatên cihanê. Serhildana ku xwedî armancên pîroz û hiqûqî, pêre kô bi pêngavên tije xwîn û ked meşrûyeta xwe bi sîstemên serdest re daye selmandin.

Komara îslamî û Kurd

Dema em li salên 1978an û şûnde li şoreşa Kurdên rojhilatê Kurdistanê dinêrin, gelek rastiyên dîrokî têne bîra me. Wan salan li dijî rejîma Pehlewî xwepêşandan û meş li Kurdistanê ti rengê xwe yê olî nebû û daxwazên gel li ser: "azadî, demokrasî û mafên netewî yên gelê Kurd" bûn. Berevajî wê alîgirên Xumeynî li Tehranê dirûşima "Êstêqlal-êstêqlan, Cimhuriyê îslamî-Serxwebûn, Serxwebûn, Komara Îslamî" bilind kirin, lê xelkê Kurdistanê bi dengekî bilind wiha qêriyan: "Azadî, Serxwebûn, Komara Gelan"

Di vî warî de jî civaka siyasî-rewşenbîrî li rojhilatê Kurdistanê zû bi paşverotiya bîr-ramanên hikûmeta nû a Îranê hesiyan ku meleyan pêşengiya wê ji destê siyasetmedarên rastîn rexistibûn. Ji ber wê jî referanduma " belê an ne" a ji komareke îslamî re yekemîn car Kurdan boykut kirin. Hîmê wê desthilatê zû û beriya herkesî li dijî mafên azadiyê ji jinê re cewherê xwe eşkere kir. Partiyên siyasî li Kurdistanê li dijî vê rêbazê derketin. Ev jî bû sedem ku hemû rêxistinên siyasî li deverên dn yên Îranê berê xwe dane Kurdistanê. Berevajî deverên din ên Îranê ku Hizbullah lê çalak bû, li Kurdistanê hemû rêxistin, partî û komên siyasî-olî û civakî azad bûn.

Bi destpêkirina xwepêşandanên li dijî hikûmeta Muhemed Riza Şahê Pehlewî re, kîna dijberiya bi sîstemên dîktator re ku bi salan di nav gelê Kurdistanê de hatibû tepeserkirin, bû qêrîn û hawarên azadiyê. Di rojên destpêkê de gel daxwaza " cî bi cîkirin an jî pêkanîna rastîn a yasaya bingehîn" dikir. Yasayên berraq ku Xumêynî li ser diaxivî. Wan dixwestin bizanin ka wê yasaya bingehîn bi qaşo şoreşa îslamî re çi cudatî bi a serdema Pehlewî re hene. Lê ligel tundbûna zordestî û tundiya desthilatdariyê, di demeke kin de ji hêla Kurdan ve daxwaza " hilanîna zulma li ser kêmnetewên etnîkî-olî" pirrengtir û dirûşmên li dijî rejîma nûhatî jî zêdetir ketin tevgerê û siyasîtir bûn.



Di dirêjahiya dîrokê de heya hingî gelê Kurdistanê ti carî ji aliyê desthilatdariya navendî ve bi awayekî cidî nehatibû hesibandin. Ew hertim di bin xezeba şik û gumanan de bûn û Kurdistan yek ji xizantirîn herêmên hemû Îranê bû. Weke ku hemû rojhilatê Kurdistanê pareke cuda be ji wilayetên din yên Îranê!. Têde zext, zor, kuştin û girtin ji her tiştekî berçavtir bûn. Welatekî mîlîtarîzekirî û tije girtîgehên mezin. Ji ber wê bû ku Kurd bi bêbaweriya xwe bi hikûmeta navendî re ji destpêkê heya wê demê bi daxwazên taybet ketin nava tevgerê. Daxwazên wan gûherandinên bingehîn û piraktîkî bûn. Bi armanca rûxandina rejîma berê beşdarî şoreşa nû a gelên Îranê bibûn, piştre serkeftina wê pîroz kirin, lê belê guh nedan daxwazên Xumeynî û hikûmeta nû a ku xwedî kirasekî hejmonîxwaz û îslam a bi nasnama xwe a Şîtiyê bû!.

Di qada olî de piraniya Kurdên li Îranê sunî ne. Hikûmeta nû hikûmeta Şîeyan û serweriya wan li ser hemû ol û mezhebên din bû. Tiştekî ku paşê di makezagona wê de krîstal bû, bi awayekî ku serokkomar û hemû berpirsên saziyên sereke yên dewletê divê Şîe bin! Tevgerên li Kurdistanê berevajî parçeyên din ên Îranê ne xwediyê rengekî olî bûn û ne jî mafên kêmnetewên din înkar dikirin. Civak ji ber hebûna partiyên siyasî û serhildanên sedsalên berê zêdetir sekular bû. Rêberekî olî yê weke Şêx Izedîn Huseynî( 1922- 2011) berevajî Xumeynî tim di wê baweriyê de bû ku divê dîn ji siyasetê cuda be. Ew wiha bû rêheval û dengê doza gelê xwe di pêkanîna daxwazên wan yên dîrokî û meşrû de.

Encam

Şoreşa Jîna Emînî xwedî hêzeke mezin û di temenê xwe yê yeksalî de destkeftên wê yên mezin hene. Dewleta totalîte a Îranê karî hinek dengê wê şoreşê bifetisîne, lê ew şoreş weke "agirê bin xwelîdankê" yê dîsa geştir bibe. Sedem jî mafxwazîyên meşrû û binpêkirî di sedan salên bihûrî de ne. Dema mafên nîva nifûsa civakê neyên dîtin lê li Rojavayê Kurdistanê û di dilê welatên Rojhilata Navîn de jin bibine sedema têkçûna DAÎŞê, elbete hingî yên jinên Kurd li perçên din yên Kurdistan, Îran, Efxanistan û hwd bêdeng nemînin. Ev şoreş yê berdewam û destkeftên wê di xêra hemû çûnên civakê û doza mirovahiyê de bin.



# Buroya Hiqûqê ya Asrinê xwe amade dikin bersivê ji bo pêşkêşiya NY'yê ya Tirkiyeyê bidin

**Navenda nûçeyan**

**Pêvajoya serlêdana Komîteya Mafên Mirovan a NY ya Buroya Hiqûqê ya Asrinê ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û sê miwekîlên xwe yên din ên li Îmraliyê kiriye, berdewam e.**

Li dijî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û sê girtiyên pê re, Buroya Hiqûqê ya Asrinê ev bêhiqûqî sala 2022'yan bir ba Neteweyên Yekbûyî. Neteweyên Yekbûyî, di vî warî de daxwaza tevdîrê li Tirkiyeyê kir û pişt re careke din heman daxwaz bi bîra Tirkiyeyê xist, lê Tirkiyeyê pê nekir û bi ser de jî di bersiva xwe de ku ji bo NY'yê nivîsî, argumanên pê van biryarên tevdîrê tune hesibandin bi kar anîn. Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan niha xwe amade dikin ku li dijî bersiva Tirkiyeyê bersivekê bidin. Parêzerê Buroya Hiqûqê ya Asrinê Îbrahîm Bîlmez ku bi ANF'ê re axivî, diyar kir ku ew ê di demeke kin de bersiva xwe bi rê bikin û wê NY ji bo esasê biryarekê bide.



**Em serî li hemû mekanîzmayan didin**

Parêzer Bîlmez, sedema birina bal lijneyên navneteweyî ya vê biryarê wiha dibêje: ''Em rû bi rûyê bêhiqûqiyeke bêhevta ne. Ji bo rabûna vê tecrîdê tiştê ji milên me tê em dikin. Em serî li hemû mekanîzmayan didin. Ji ber ku em ji çar miwekîlên xwe ku di girtîgeheke Wezareta Dadê de ne, du sal û nîv in tu agahiyan nagirin. Ev rewş li welatên herî paşdemayî yên cîhanê jî nîn e. Baş in ya na, me hay ji tenduristiya wan nîn in. Me berê ev mijar her dibir ba saziyên Konseya Ewropayê. Ji sala 1999'an ve em vê dikin. Lê heta niha encama ku em dixwazin bi dest me neketiye. Ji wê boneyê me got em serî li Neteweyên Yekbûyî bidin. Saziyeke Neteweyên Yekbûyî ya bi navê Komîteya Mafên Mirovan heye. Ev komîte, mîna Dadgeha Mafê Mirovan dadgeheke navneteweyî ye. Bi tenê welatên Konseya Ewropayê ne di nav vê çarçoveyê de ne. Hemû welatên ku endamên NY'yê ne, di nava vê çarçoveyê de ne. Li ser wan erkdar e. Bi binpêkariyên mafên mirovan de dikeve û biryarê dide. Ji ber ku bi ya me tecrîd dûrê mafên mirovan e, me biryar da ku bibin ba Neteweyên Yekbûyî.''

**Tirkiye li gor biryara tevdîrê tevnegeriya**

Parêzer Îbrahîm Bîlmez bi bîr xist ku ji ber ku tu rêyeke hiqûqî ya navxweyî nehatiye hiştin û Tirkiye bi tu biryarê nake û wiha pê de çû:''Ji bo em biryarê bibin ba Neteweyên Yekbûyî, divê pêşîn tu rêyeke hiqûqî ya navxweyî nemaya. Lewma me serlêdanên xwe yên têkildarê tecrîdê kirin. Hemû serlêdanên me ku hatin redkirin, me serî li dadgeha cezayên giran da, wê derê jî serlêdana me red kir. Me 24'ê Çileya Pêşîn serî Dadgeha Makezagonê da. Wê jî daxwaza me ya ji bo tevdîrê red kir. Tu rêyeke hiqûqî ya navxweyî nema. Ji lewma me di 29'ê Tîrmeha sala 2022'yan serî li Komîteya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî da. Me cardin bi daxwaza tevdîrê serlêdan kir. Me got ku ji 25'ê Adara sala 2021'ê ve ye ku me tu hay ji Rêber Apo û her sê wekîlên me yên din nîn e. Li gor nivîsarên ku NY'yê ku ji xwe re kirine esas jî, me got ku ev cureyekî rejîma înfazê ye, ku kes nekare xwe bigihîne wan, tu hay




jê nîn be êşkence ye. Li gor hin biryarên ku jixwe komîteyê dane, ji vê re tiştekê wek ''revandin'' tê gotin.

Komîteya Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî 6'ê Îlona sala 2022'yan di vê mijarê de daxwaza tevdîrê kir û nivîs ji bo Tirkiyeyê nivîsî. Ji hikûmeta Tirkiyeyê re got: 'Parêzerên Rêber Apo û yên her sê miwekîlên din serlêdan kirin û wan tu hay jê nîn e. Lewma bihêlin ku bêyî tu astengiyê bi parêzerên ku dixwazin re bikarin hevdîtinê bikin.' Lê Tirkiye ev bi cih neanî. Li ser vê me agahdariyek kir. Me got Tirkiye ya pêwist nake. Ji wê boneyê hûn tiştekî bikin. Meha Çileya sala 2023'yan Komîteya Mafên Mirovan cardin dema tevdîr bi bîra hikûmetê xist û got ya pêwist bikin û me piştî wê biryarê cardin hem serî li dadgeriya înfazê da hem jî me ev daxwaza tevdîrê pêşkêşê Dadgeha Makezagonê kir. Lê ji van meqaman tu yekê tiştek nekir.''

**Tirkiyeyê pêvajoya çûyî jixwe hesab nekiriye**

Parêzer Bîlmez wek encam got ku pêvajo berdewam e û ew ê bersiva xwe ya li dijî pêşkêşiya ku Tirkiyeyê ji NY'yê re kiriye, pêşkêşe komîteyê bikin û wiha dawî li axavtina xwe anî: ''Hikûmetê herî dawî fikirên xwe şandin ji Neteweyên Yekbûyî re. Lê ev hikûmeta di fikirên xwe de tu behsa daxwaza me ya tevdîrê û biryara bertekî ya ku NY'yê daye, nekiriye, jixwe hesab nekiriye. Tu bersiv nedaye. Lewra tu bersiva bide nîn e. Piştî ku bersivên xwe şandin wê komîte têkildarî esasan biryarekê bide. Lê wê ev çiqas li ber xwe bide em hêj nizanin.''

# KCK: Dewleta Tirk dixwaze dagirkeriya xwe li Iraq û Sûriyeyê mayinde bike

**Komîteya Têkiliyên Derve ya KCK'ê. Dewleta Tirk ku hem li Iraqê hem jî li Sûriyeyê mafê serweriyê yê herdû welatan binpê kiriye, dixwaze dagirkeriya xwe ya li Iraq û Sûriyeyê mayinde bike.**

Komîteya Têkiliyên Derve ya KCK'ê li ser bûyerên li Kerkûk û Dêrazorê diqewimin daxuyaniyek weşand. KCK'ê got, "Iraq û Sûriye ku piştî êrîşên DAIŞ'ê li bin guhê hev ket û hîn jî nekarîn aram bibin, li Kerkûk û Dêrazorê ber bi rageşî û şerekî nû ve têne kişandin.

Eşkere ye ku rageşiya li Kerkûk û Dêrazorê ji ber xwe ve nebûye, pêwendiya vê rageşiyê yekser bi serdana Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Hakan Fîdan heye ku 22-24'ê Tebaxê serdana Bexda û Hewlêrê kir. Ji xwe daxuyaniyên Tayyîp Erdogan û Hakan Fîdan ên li ser herdû qadan, di heman demê de nêt û bendewariya dewleta Tirk jî radixin pêş çavan."

Daxuyaniya Komîteya Têkiliyên Derve ya KCK'ê bi vî rengî de-



wam kir:

"Hakan Fîdan îdîa kir ku şerê li Kerkûkê yê ku 4 kes mirin, ji aliyê PKK'ê ve hatiye destpêkirin. Erdogan jî dema ji Rûsyayê vedigeriya li ser şer û rageşiya li Dêrazorê got, ku di dema xwe de gaveke gelekî baş û di cih de ye. Bi vî rengî piştgiriya xwe ya ji bo çeteyên dest bi vî şerî kirin, nîşan da.

Dewleta Tirk ku hem li Iraqê hem jî li Sûriyeyê mafên serweriyê yên herdû welatan binpê dike û li herdû welatan di asta dagirkeriyê de ye, mîna dagirkeriya li Qibrisê ya sala 1974'an dixwaze dagirkeriya xwe ya li Iraq û Sûriyeyê dirêj bike û bi vî rengî mayinde bike. Hakan Fîdan ku dema serokatî ji îstîxbarata Tirk (MÎT) re dikir li nava welêt di serî de înfaz û komkujî her cûre rêbazên şerê qirêj û provakasyon bi kar dianî, van karên xwe yên qirêj niha jî bi navê wezîrê karên derve di bin navê dîplomasiyê de dimeşîne.

**Eniya tirkmen û PDK yekser ji MÎT'ê re dixebitin**

Li Kerkûkê Kurd, Ereb, Tirkmen, Asûrî-Suryanî û Ermen bi sedan sal in bi hev re dimînin. Hakan Fîdan û Tayyîp Erdogan Kerkûk weke 'warê Tirkan', 'bajarê Tirkmen' ragihandin û ji bo armancên xwe yên dagirkerî û mêtingeriyê veşêrin û PDK û malbata Barzanî bi kar tînin. Salên dawî hewl dide Kerkûkê bike navenda MÎT'ê ya sîxurkirinê, provakasyonan, rewakirina dagirkeriyê û bicihbûna li Başûrê Kurdistanê. Kerkûk ku ji demên kevn heta niha gelek etnîsîte, bawerî û çandên cuda di nava xwe de vehewand, bi tevdanên Tirkiyeyê dikin navendeke nû ya şer û rageşiyê.

Eniya Tirkmen û Rêveberiya PDK'ê ku yekser ji Enqere û MÎT'ê re dixebitin, hewl didin dîktatoriya Erdogan û dewleta Tirk a ku li nava civaka Iraqê û hikumeta Bexdayê de bêqîmet e, rewa bikin.

Tirkiye bi rêya hin kesayetên Tirkmen ên ku kiriye çete û xistiye bin kontrola xwe, her wiha bi piştgiriya malbata Barzanî hewl dide zextê li ser rêveberiya Bexdayê bike. Kerkûk bajarekî bêhempa yê dewlemend e ku bi dîrok, realîteya xwe ya civakî û cihêrengiya xwe xwedî tecrûbeyeke jiyanê ye. Lewma divê destûr ji dewleta Tirk a faşîst dagirker û hevalbendên wê re neyê dayin ku bajarekî bi vî rengî yê bêhempa bikin qadeke parvekirina rant, rêveberî û amûra xwe ya desthilatdariyê. Gelên Kerkûkê li dijî her cûre destwerdanên ji derve, li hemberî polîtîkayên dagirkeriyê yên dixwazin gelan berde hev, divê helwestê nîşan bidin, bingeha jiyana hevpar û rêveberiya xwe bi xwe xurt bikin, ji bo Kerkûkê bikin keleha aştiyê, biratiyê, demokrasî û azadiyê xwe bi rêxistin bikin û têbikoşin.

Parvekirina Kerkûkê li ser xak û taxan, bawerî û etnîsîteyan, nifûs û hejmara şêniyan, qada bazariyê ya li ser hesabên hatineya petrolê tê wê wateyê ku Kerkûk, lewma jî Iraq timî di nava krîzê de bê hiştin. Gel, etnîsîteyên cuda, bawerî û olên cuda, jin û ciwanên Kerkûkî xwedî wê kapasîteyê ne ku jiyaneke hevpar û bi hev re li Kerkûkê ava bikin, di nava aştî û aramiyê de îradeya jiyanê nîşan bidin û xwe bi rê ve bibin.

Li ser vê bingehê, yekane karê ku dilxwazên aştî, aramiyê yên li Kerkûkê divê bike ew e ku li ber dagirkeriya dewleta Tirk a li Iraqê rabin. Divê 90 qereqolên Tirk ên li ser xaka Iraqê bêne avêtin. Tirkiyeyê Hewlêr ji xwe re kiriye bexçeyê paş, lewma divê li hemberî hegemonya aborî, çandî û siyasî ya Tirkiyeyê ya li ser Başûrê Kurdistanê helwest bê nîşandan. Piştî ku dawî li dagirkeriya dîktatoriya Erdogan û dewleta Tirk a li ser xaka Iraqê hate anîn û ji Kerkûkê hate dûrxistin, hingî li Iraq, Kerkûk, Sûriye, Lîbya, her wiha li tevahiya Rojhilata Navîn wê aramî pêk were."

# Xiyaneta PDK'ê û ENKS'ê ya li dijî şoreşa Rojava bê sînor e

Ji destpêka şoreşa 19'ê Tîrmehê ve, PDK û ENKS'ê ji bo têkbirina şoreşê çi ji destê wan hat kirin, di tevahiya êrîşên li ser Rojava de, ew xwdî rolbûn û ji dagirkeriya Tirk re bûn amûr. Herwiha di guhertina demografî de ya ku li Efrînê tê meşandin, rola PDK û ENKS'ê sereke bû.

**Reşo Mihemed /Qamişlo**

Hêzên dagirker ji bo qirkirina gelê Kurd bi 100'ê salane êrîşên domdar li ser Kurdistanê didin meşndin, li hemberî wê jî gelê kurd herdem di nava têkoşîn û berxwedaniyê de ye. Hin hêzên ku qaşo dibêjin em kurdin jî, ji dijminê gelê Kurd re dibin sîxur û destek. Tişta ku dijminê gelê kurd nikaribe bike, ev kurdên xayîn dikiin. Mînaka van hêzên xayîn jî, PDK û ENKS'ê ye. Ji destpêka Şoreşa 19'ê Tîrmêhê û heta niha, PDK û ENKS''ê her dem li kêleka dagirkeriya Tirk di nava êrîş ûş planên li dijî Rojava cihê xwe girtine, herwiha ji bo têkbirina Şoreşê çi ji destên wan hatiye kirine.




### PDK'ê di 2011 de ENKS'ê ji bo xiyaneta li kurdên Rojava erkdar kir.

Di sala 2011'an de, pêngaveke nû ya xiyaneta PDK'ê li dijî gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê hat destpêkirin. Ji destpêka Şoreşa Rojava ve PDK'ê û ENKS'ê KOMêN Çekdar yên bi navê Leşkerên Roj dan avakirin, ev çekdarên vê komê jî raste rast bi MÎT'ê ve girêdayîbûn, fermanên xwe jê digirtin û lêi ser destê dagirkeriya Tirk hatin perwerdekirin. Yek ji endamên Leşkerê Roj ku di sala 2016'an de tevlî vê komê bibû û piştî rastiya wan naskir ji nava wan reviya û tevlî nava refên QSD'ê bû, Salar Ismayîle, wê di hevpeyvînekê de ji ajansa ANHA'yê re ragehandin ku dagirkeriya Tirk bi awayekî eşker perwerdeyê dide leşkerên Roj,

Li aliyekî din jî Wezîrê wezareta pêşmerge ya Başûrê Kurdistinê Cebar Alyawer derbarê Leşkerên Roj de wiha gotibû: "Em nizanin bê kî Leşkerên Roj perwerde dike.", ew baş nas dike ku li ser destê dagirkeriya Tirk tên perwerdekirin, lê rastiyê nabeje.

Bi destpêkirina Şoreşa 19'ê Tîrmehê re, Leşkerên Roj weke girûpeke leşkerî mil bi mil li kêleka çeteyên Elqaîde, Cebhet Elnusra û Artêşa Azad şerê gelê kurd dikirin. Ev komên çete jî yekser çek û alîkariyên lojistî ji dagirkeriya Tirkiyê werdigirtin. Li Rojavayê Kurdistanê jî dewleta Tirk ya faşist wan erkdarkiribûn da ku gelê Kurd qir bikin. Herwiha bi çekên xwe bûn sûcdarê şehadeta gelek kurdan.

### ENKS'ê bi destê MÎTa Tirk hat damezrandin

Piştî sestpêkirina aloziya Sûriyê , çend partiyên girêdayî PDK'ê bi fermana MÎT'a Tirk ENKS'ê ava kirin. ENKS'ê di nav xwe de ji 11 partiyan pêk dihat, lê ji aliyê 5 partiyan ve anku ji aliyê 5 kesan ve dihat birêvebirin. Kesên ku ENKS'ê bi rê ve dibin ev in, ji Partiya Demokrat a Kurdistanê-Sûriyê Siûd El-Mele (yê berê) û niha jî (Mihemed Ismayîl), Partiya Demokrat a Nîştimanî ya Kurdî Tahir Sifûk, Partiya Wekhevî ya Demokrat a Kurdî Nehmet Dawûd, Partiya Çaksazî ya Kurdî Feysel Yûsif û Partiya Yekitî ya Kurdî ya Sûrî Îbrahîm Biro.

Rêveberên her pênc partiyan wekî alav di destê istixbaratên dewleta Tirk de ne û dewleta Tirk destekê dide wan. Wan kesan hemû hewldanên xwe kirin da ku xîtaba Kurdên Rojava asteng bikin. Herwiha dema komên çete di sala 2012`an de dest bi êrîşa li ser Serêkaniyê kirin, van partiyan destek dan komên çete yên ku li Serêkaniyê pê li ala PDK'ê kirin. Herwiha Di derheqê xelkê Serêkaniyê de jî gelek kuştin, wêrankirin û destddirêjî ji aliyê komên çete, dagirkeriya Tirk û hevkara wê ENKS'ê ve hat kirin. Piştî ku Rêveberiya Xweser di 2014'an de hat damezrandin, ENKS, PDK'ê û dewleta Tirk aliyên yekemîn bûn ku li hember projeya wê sekinîn. Herwiha ENKS'ê bi hevkariya PDK'ê bi hemû awayan xwest şoreşa gelên azad vemrîne.

Di 2014'an de, di dema ku Rojavayê Kurdistanê di bin êriş û dorpêçek dijwar de bû, ji aliyekê şerê hikumeta Şamê û grûbên çeteyên tundrew û çeteyên Opizisyona Sûriyê, li aliyekê êriş û gefên dewleta Tirk û çeteyên wê yên DAIŞ'ê, hebû, li aliyê din jî PDK'ê dest bi kolandina xendeqa şermê ya di navbera Başûrê û Rojavayê Kurdistanê kirbû û gelên Rojava dorpêç dikr. Biryara kolandina xendeqa di navbera Rojava û Başûrê Kurdistanê de, yekrarst ji dagirkeriya Tirkiyê bû.

ENKS'ê û PDK'ê xeta xiyanetê bi gelê kurd re kiriye armanca xwe ya sereke. Herwiha ji bo ku Şoreşa Rojava têk biçe, ew û dagirkeriya Tirk bûn hevkar. Ji dema ku dorpêç li ser kurdên Rojava bi riya kolandina xindeqên şermê heta beriya êrîşa li ser Efrîn û gudewarên wê, dijberiya wan ji gelê kurd re eşkere bû.

### Xiyaneta PDK û ENKS'ê li Efrînê

Beriya ku dewleta Tirk a dagirker di 20`ê Çileyê 2018`an de êrîşî kantona Efrînê bike, Îbrahîm Biro di Tîrmeha 2017`an de li bajarê Cerablusê bi çeteyên girêdayî dewleta Tirk re civiya. Di civînê de amadekariyên êrîşa li ser Efrînê û awayê pêkanîna êrişan hate nîqaşkirin. Nakokî di navbera Îbrahîm Biro û rêveberên din ên ENKS`ê de derketin. Ji ber ku Îbrahîm Biro bêyî agahiya rêveberiya ENKS`ê beşdarî wê civînê bûbû. Li gorî agahiyan, Îbrahîm Biro agahî da rêveberiya ENKS`ê yên red kirin ku tev li civînê bibin ku beşdarbûna wan li gorî perspektîfên ji PDK`ê û Barzanî bû û ev jî piştî civîna wî ya bi berpirsên AKP`ê re hate kirin.

Di 20'ê Çileya 2018'an de dagirkeriya Tirkî û komên çete yên girêdayî wê êrîşî Efrînê kirin. Di dema şervanên YPG û YPJ'ê berevaniya gel û xaka Efrînê ji êrîşên hovanê yên dagirkeriya Tirkî dikirin, ENKS'ê û PDK'ê ji vê yekê jî bê deng bûn. Bêdengiya wan jî erêkirina wan ji qirkirina kurdên Efrînê re dixuye.

### Destekdayîna dorpêça li ser Rojava

PDK'ê li ser xwesteka dewleta Tirk ya dagirker deriyê sînorî yê Sêmalka yê di navbêra Başûr û Rojavayê Kurdistanê de gelek caran girt. Armanca wê ya bingehîn jî derket holê ku ev yek piştî dewleta Tirk Serêkaniyê dagir kir, encam da. Pişt ku PDK'ê deriyê Sêmalka girt, endamên ENKS'ê yên êdî qaçaxçitiya mirov û hişberiyan dikirin.Wê demê jî welatiyên Rojava derbasî Başûrê Kurdistanê bikin. Ev yek ji pilanên ku bi xwesteka Tirkiyê dihat pêkanîn. Armanc jê jî hewildana meşandina şerê taybet li ser kurdên Rojava bû. ENKS'ê û mala Barzanî weke her car li dijî kurdan kar dikin û di destê Tirkiyê de bûne weke lîstokê. Di heman demê têkbirina şoreşa ku bi saya xwîna hezarên şehîdan gihaştiye vê astê, bûye armanca wan. Herwiha deriyê Sêmalka yê sînorî yê di navbera Rojava û Başûrê Kurdistanê ku dibe riya wergirtina pêwîstiyên sereke ji bo gelê Rojava, li dijî gel bikar dianî. Deriyê Sêmalka ji sala 2013an ve rêyeke sereke û girîng di navbera Başûr û Rojavayê Kurdistanê de ye. Lê PDK'ê ji destpêka vekirina wê heta niha 6 caran ev derî li ber kurdên Rojava giritiye. Di sala 2013'an de 2 caran , di sala 2016 de jî carek, di 2020'an û 2021 de carek, herî dawî jî di 11'ê Gulana 2023'an de hatiye girtin û di 5'ê Pûşbirê de jî hatiye vekirin. Armanca PDK'ê bi girtina sînorî pêkanîna pilanên dagirkeriya Tirkî ye.


### ENKS'ê hewil da ku zimanê kurdî bihilîne

Dema ku nêzîkbûneke kurdî-kurdî li Rojavayê Kurdistanê di sala 2020'an de çêdibû, ENKS'ê li dijî gelê kurd kar dikir. Wê destpêkê sîstema perwerde û fêrkirinê ya Rêveberiya Xweser û bi taybet perwerdeya bi zimanê kurdî qebûl nekir. Lê belê perwerdeya hikumeta Şamê li şûna perwerdeya Rêveberiya Xweser pejirand. Ev neqebûlkirin, qirkirina bedenî û çandî bi xwe ye. Kiryarên wê yên qirêj li vir bidawî nebûn, di heman demê de jî xiyanet û hevkariya wan bi dijminên kurdan re tê diyarkirin. Ew û dagirkeriya Tirkî bûn destek û xwestin siyaseteke baviksalariyê li ser jinên Rojava bimeşînin. Ev yek jî bi riya dijbertiya wan ji sîstema hevserokatiyê re xuya bû. Ji ber ku jinên Rojava pêşengên Şoreşa 19'ê Tîrmehê ne, ew ji xwe re kirnin armanc, lê jinên Rojava ji PDK'ê ENKS'ê û dagirkeriya Tirkiyê bi hêztir bûn. Wan gavên dîrokî û cîhanî avêtin pêş û berxwedaneke bêhempa kirin.

### Li Efrîna dagirkirî saziyên PDK'ê

Ji destpêka ku Efrîn hat dagirkirin, binpêkirinên ku derheqê xelkên Efrînê de tên kirin ji hemû kesî re diyar in. Li aliyekî din jî cîhan tev ji van binpêkirinên dermirovî bêdeng in. Di nav de jî PDK'ê ya ku ne tenê ji vê dagrkeriyê re bêdeng e, lê belê destekê dide wê û vê dagirkeriyê qebûl dike. Ji bo em tekeziya vê qebûlkirinê nas bikin jî, divê Vekirina Nivîsgeha girêdayî Saziya Barzanî ya Xêrxwaziyê were bîra me. Bi fermî ji aliyê PDK'ê ve, di 19'ê Sibatê de li Efrînê hat vekirin. Qaşo ev yek ji bo destekdayîna mexdûrên Erdheja 6'ê Sibatê bû. Lê vekirina vê nivîsgehê vekirna nameyeke qirêj di nav xwe de dihewand. Belê nameya qebûlkirina dagirkeriya ku li ser Efrînê ye ji kurdên Rojava re rê kir. Dîsa weke he dem ENKS'ê û PDK'ê bi dagirkeiya Tirkiyê re dicivin. Herwiha pilanên têkbirina Şoreşa 19'ê Tîrmehê û Rêveberiya Xweser bi hev re parve dikin.

## Êrîşên ser Başûr û Rojava ên hemwext!



**Ahmet Aktaş**

Bûyerên van rojên dawî yên li Kerkûk û Dêrezorê pêk tên balkêş e.!
Gotina dawî, heke li pêşî were gotin; li pey her du bûyeran jî destê dewleta tirk heye. Erê nuha navê Kerkûkê û Dêrezorê derketiyê pêş, ji ber ku taybetmendiyên van bajaran hene, lê bi bingehîn êrîşên dewleta tirk, yekser jî, him li tevaya Başûr û him li tevaya Rojava her dewam dike.
Bi tenê cudahiya van êrîşên dawî yên ser her du herêman ev e; dewleta tirk, ji bo ku êrîşên xwe yên yekser sernuxûm bike, taybetmendiyên van herêman dide xebitandin.
Li Kerkûkê him bi nasnama Tirkmenî û him bi nasnama olî-mezhebî, Ereb û Kurd û Tirkmenên Sune jî bi hevre tevgêr dike, li dijî olî-mezhebiya şîa radike serhildanê.
Li Dêrezorê jî gelek eşîrên cuda yên Ereban tevgêr dike û li dijî hêzên Rêveberiya Xweser radike raperînê.
Erê dibe ku li Kerkûkê bi giranî dijberiya hêzên ser bi Îranê tên xuya kirin, lê belê li herdû herêman jî dijberiya bingehîn a li hemberî Tevgera Azadiya Gelê Kurdistanê ye.
Ev armancên mijara gotinê, jixwe di projeya despêkê de ya ku dan destê Receb T.Erdogan de hene û armancên stratejîk in. Dibe ku ev proje hatibe jibîrkirin.
Ka em bînin bîra xwe; 20 sal berê DYEyê bi navê Projeya Mezin a Rojhilata Navîn amade kiribû û pêşkêşî raya giştî cîhanê jî kiri bû. Herwiha hevserokên vê projeyê jî Corc W.Buch û Receb T.Erdogan bûn!
Di vê hilbijartina Tirkiyê ya giştî de, xwestin şûna Receb T.Erdogan, Kemal Kiliçdaroglû erkdar bikin. Lê dîtin ku Kilçdaroglu ne erbabê vî kariye û Receb bi kêrhatîtir e.
Herwiha şerê Ukrayna-Rûsya jî, weke bombeyê ket rojevê, lewma hegemonên cihanê, li gel DYEyê biryar dan ku, Receb T.Erdogan, ji bo berjewendên dewletên wan baştir e.
Jixwe ew gera H.Fidan a bi lez û dengveda, parçeyê vê biryara dawî bû. Lewma, hema li pey gera wî van êrîşên hemdem ên xwînrij despêkir.
Herwiha him H.Fidan him Receb T.Erdogan, li pey hev piştgiriya xwe ya ji bo êrîşên Kerkûkê û Dêrezorê aşkere diyar kirin,
Di van bûyeran de û bi taybetî jî li ser bûyerên Dêrezorê, helwesta dewleta Şamê û Enqereyê hema hema weke hev bûn. Daxuyaniyên wan ên li dijî Tevgera Azadiya Gelê Kurdistanê pir dişibîn hev.
Wezîrê derve yê Şamê Faisal Mekdad û wezîrê derve yê Enqereyê Hakan Fidan, hema hema weke hev diaxivin û piştgriyê didin eşîrên Ereban ên Dêrezorê. Her wiha roja Receb T.Erdogan ji SOÇÎ vegeriya, wî jî bi heman zimanî pesindariya êrîşên komên çete ên ser HSDê kir.
Fidanê "Kurmê darê", li goreyî giraniya xiyaneta xwe gotin dikir û mîna li Başûr digot; "PKKê xaka Iraqê dagir kiriye", li vira jî digot; "YPGê xaka ereban dagir kiri ye".
Bi kurtayî, navê xwe li Tevgera Azadiya Kurdistanê dike û "kumê serê xwe" û "serê Receb", dide serê PKK û PYDê!
Wisa diyar dibe ku, Tevgera Azadiyê, wê vê plana qirêj jî hilweşîne. Bêguman hişyarî û amadekarî her divê!



# 'Em piştgiriya xwepêşandanên gel li Siwêdayê dikin'

Piştî derbasbûna 12 salan di ser kirîza Sûriyê re, welatiyên Siwêydayê carke din li dijî hikumeta Şamê serî hildan û banga guhertina sîstema desthiltdar kirin. Endamê Partiya Sûriye Pêşeroj Mihemed Bêrem anî zimnan hikumeta Şamê li ser xwîna gelan desthilatdarî û berjewendiyên xwe diparêze û got, em piştgiriya xwepêşandanên gel li Siwêdayê dikin.

**Vîndar Roj/ Şehba**

Bihara gelan ya ku ji Tunisê dest pê kir herî dawî di 2011'an de li Sûriyê bidawî bû û hat xetimandin. Şoreşa Sûriyê weke nav tenê demeke kin di cewherê Şoreşgertiyê de hat meşandin, lê belê piştî salekê armancên Şoreşê hatin guhartin û di karekterê alozî û qeyranê de berdewam kir. Hikumeta Şamê li ax û gelên Sûriyê bi hêzên mêtinger yên hegemon re ket nava pilanan û Sûriyê perçe perçe kir. Piraniya gelên Sûriyê berê xwe dan koçberiyê û yên di axa Sûriyê de jî mane bi zehmetî jiyan dikin. Ji aliyê navnetewî ve jî cezayên Zagona El Qeyser li ser Sûriyê hatin ferizkirin. Piştî van cezeyan rewşa Sûriyê de aliyê aborî de bi temamî têk çû. Piştî 13 salan niha careke din gelê Sûriyê li hember Hikumeta Sûriyê serî rakiriye û banga guhartina sîstema heyî dikin.

Têkildarî xwepêşandanên ku li bajarê Siweydayê hatine destpêkirin, Endamê Partiya Sûriye Pêşeroj Mihemed Bêrem ji rojnameya me re axivî.

### 'Hêviyên gelê Sûriyê di bin zexta dewletê de hatin tepisandin'

Mihemed di destpêkê de bal kişand ser destpêka seerhildanên gel yên di 2011'an de û wiha got: "Bihara gelan ya ku ji bo guhartina sîstemên desthilatdar yên di Rojhilata Navîn de hat destpêkirin, di gelek welatên Ereban re derbas bû. Lê belê van serhildanan tiştek neda guhartin. Ji ber armancên wan ne diyar bûn, her wiha bi guhartina kesayet sîstem nayê guhartin, ji lewra ev xwepêşandan negihîştin tu encaman. Di 2011'an de ev serhildan derbasî xaka Sûriyê bû. Gelê Sûriyê bi pêkhateyên heyî re daketin qadan û banga guhartina sîstema desthiltdar bi giştî kirin. Ev serhildan tenê 6 mehan di wateya rast ya serhildanê de




ma. Lê bi destwerdanên hêzên derdor yên weke Îran, Rûsya û Tirkiyê dizî, kuştin û talankirinê û revandinê dest pê kir. Dema destwerdan ji aliyê hêzên dagirker yên ku axa Sûriyê perçe kirin dest pê kir, gelê Sûriyê bûn qurbanî ji siyaseta dewlet û dagirkeriyê re. Ji lewra hêviyên gel di bin zexta dewletê de tepisîn".

### 'Aboriya Sûriyê têk çû û gel mecbûre rabe ser piyan'

Mihemed anî ziman ku hikumeta Şamê di kirîzeke aborî re derbas dibe û bê guman wê gel li hember wê serî rake û wiha domand: "Hevgirtin û planê hikumeta Şamê yên ku bi hêzên derdor re hatin çêkirin, her wiha li hember rewşa gel xwe berpirisyar nedîtin, hîşt ku temenê aloziya Sûriyê dirêjtir bibe û bibe sedema talankirin û perçekirina Sûriyê. Aboriya Sûriyê ji gelek welatên Rojhilata Navîn xurtir bû, lê belê hikumetê tiştek ji bo gel pêşkêş nekir û her tim gel di birçîbûn û şer de hîşt. Bi ferzkirina cezayên Zagona El Qeyser li ser Sûriyê aboriya Sûriyê ji binî de têk çû û tu çareserî ji aliyê hikumetê ve nehat dîtin. Ji ber vê yekê gel ji bo jiyankirinê pêwîstiya wê bi destekdayîn û çareseriya kirîza aborî heye. Lê di encamê de gel careke din ji nû ve rabûye ser piyan û banga guhartina rewşa heyî dike."



### Gelê Sûriyê rabûye ser piyan

Girêdayî heman mijarê mihemed diyar kir ku Ji bo dîtina çareseriyê pêwîstî bi serhildana gel heye û wiha got: "Ji bo redkirina siyasetên ku li ser gel tên meşandin û guhartina rewşa heyî ya Sûriyê, gelê bajarê Siwêda rabûn xwepêşandanan û bi siloganên ku banga demokrasî û derxistina hêzên dagirker ji xaka Sûriyê ev xwepêşandan tên xemilandin. Bi rastî em vê gavê weke gaveke pîroz dibînin. Di van çend rojan de gelê Siwêda dest bi birêvebirina saziyên gel kirine, bi armanca avakirina xweseriya xwe hamû sazî û destgehên, weke parastin, şeredarî, kar û barên civakî yên di hundir bajêr de birêve dibin. Bê guman ji bo çareseriyê pêwîstî bi serhildana gel li herêmên hikumeta Şamê û herêmên dagirkirî heye".

### 'Bi rihê şoreşa 19 ê Tîrmehê em serkeftinê ji van xwepêşandanan re hêvî dikin'

Endamê Partiya Sûriye Pêşeroj Mihemed Bêrem piştgirî ji bo xwepêşandanên Siwêdayê nîşan da û wiha bi dawî kir: "Di van xwepêşandanên ku ji bo aştî, azadî û mafê gel hatine lidarxistin, em banga gelê serhildêr dikin ku nekevin xefka şoreşa 2011'an ya ku ji aliyê dagirkeran û berjewendiyên serweran ve hatiye rûxandin. Divê ev xwepêşandan bigihêjin armanc û daxwazên gel. Her wiha dema em dibînin ku di hundir wan xwepêşandanan de Navê Şehîd Hevrîn Xelef û silogana Berxwedan Jiyan e tê rakirin, tê dîtin ku şoreşa 19'ê Tîrmehê mohra xwe li dîrokê xistiye û hêştiye ku bibe mînak ji tavahî gelan re. Li ser wî esasê em piştgiriya xwe ji bo gelên ku rabûna ser piyan û hewildana pêkanîna çareseriyeke bingehîn ji bo tavahî gelê Sûriyê raber dikin".

# 'Bi têkoşîn û berxwedaniyê wê tecrîd têk biçe'

**Ayişa Silêman/Qamişlo**

**Dewleta Tirk a faşîst bi armanca tekbirina vîna gelê kurd tecrîda li ser Rêber Apo girantir dike û li Îmraliyê tevahiya pîvan û nirxên mirovahiyê bipê dike, endamê PYD'ê Silêman Ebû Bekir diyar kir ew ê bi têkoşîn û berxwedaniyê tecrîdê têk bibin.**

Dewleta Tirk a dagirker di 1999'an de di encama komployeke navneteweyî de Rêber Gelê Kurd Ebdullah Ocalan dîl girt, herwiha ji wê demê ve û heta niha li ser Rêber Apo tecrîdeke giran tê feriz kirin. Dewleta Tirk a dagirker li Îmraliyê tevahiya zagon û pîvanên mafê mirovan binpê dike, lê tevî wê jî tevahiya cîhanê li hemberî van kiryaran bê denge, rêxistinên ku qaşo bi navê mafê mirovan bang dikin jî, ji berjewendiyên xwe, li hemberî tecrîdê xwe ker, lal û kor dikin. Derbarê tecrîda girankirî ya ku




li ser Rêber Apo hatiye ferzkirin û bêdengiya navneteweyî ya li hemberî vê tecrîdê, endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), Silêman Ebû Bekir ji rojnameya me re axivî.

### 'Rêber Apo ji bo azadiya gelên bindest têkoşînê dike'

Silêman Ebû Bekir di destpêka axaftina xwe de balkişand ser girîngiya fikrê Rêber Apo ji bo çareseriya tevahiya pirsgirêkên Rojhilata Navîn û cîhanê û wiha got: "Rêber Apo bi fikr û felsefeya xwe ji tevahiya pirsgirêkên Rojhilata Navîn re cihê çareseriyê ye, ji bo her pirsgirêkekê Rêber Apo çareserî û pêvajoyek daye nîşandan. Di dema ku gelê kurd ber bi qirkirinê ve diçû, Rêber Apo Tevgera Azadiyê damezrand û dest bi têkoşîneke bê hempa kir, ew ne tenê ji bo gelê kurd, ji bo tevahiya gelên bindest û azadîxwaz berxwedanî kir û hîn jî dike. Hêzên hegemonîk herdem hewil dane ku gelê kurd ji kokê ve rakin û qirbikin, lê bi saya fikr û têkoşîna Rêber Apo gelê kurd zincîra koletiyê qetand."

### `Hebûna me bi berxwedaniya Rêber Apo ve girêdayî ye`

Ebo Bekir da zanîn ku bi berxwedana Rêber Apo gelê kurd ji qirkirinê rizgar bû û wiha ûgot: "Em wek gelê kurd divê nasbikin wateya berxwedaniya Rêber Apo çiye û em sûd bigrin, eger ne ji berxwedan û têkoşîna Rêber Apo bû ya, wê gelê kurd bi temamî hatiba qirkirin. Berxwedana Rêber Apo hebûna gelê kurd parast, ji ber vê yekê hebûna me bi berxwedaniya Rêber ve girêdayî ye û ji nav cîhanî bi giştî de em dikarin bêjin yê ku rastiya fikrê Rêber nas kir û şopand gelê kurd e, êdî tu kes nikare me bide tunekirin."

Ebo Bekir di dewamiya axaftina xwe de wiha got: "Bi saya fikrê Rêber Apo di şoreşa Rojava de gelek destkeftî hatin bidestxistin, bi taybet di milê yekîtiya gelan de, projeya biratiya gelan bi prtaîk hat meşandin, mînaka wê jî di nava refên Yekîneyên Prastina Gel YPG'ê û Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê tevahiya pêkhateyan cihê xwe girtin û ji bo parastina xaka xwe berxwedanî kirin. Ne tenê ji bakur û rojhilatê Sûriyê, gelek ciwanên enternasiyonal jî tevlî nava refên şoreşgerî bûn. Fikrên Rêber Apo sînor derbas kirin û li tevahiya cîhanê belav bû û bandor kir."

### `Ji bo azadiyê têkoşîn pêwîste`

Endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Silêman Ebû Bekir axaftina xwe wiha bi dawî kir û got: "Têkoşîn û berxwedaniya Rêber Apo hebûna gelên bindest û azadîxwaz misoger dike, divê tevahiya gelên azadîxwaz layiqê berxwedana Rêber Apo bin, bi taybet gelê kurd divê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo asta têkoşînê bilintir bike. Hêviya min ewe ku her kes di hişmendiya xwe de her tim Rêber Apo jiyan bike, divê kar û xebat tev ji bo misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bin."